



Ji bo mirovên ciwan
ên pereyên wan kêr
alîkariyên
pere yên BuT'ê hene.

BuT kurtkirina ji bo Perwerde
(Bildung) û Beşdariyê (Teilhabe) ye.

Maneya **beşdariyê**:

Pê re bûn, bi hev re kirina karekî ye

Bi BuT'ê mesrefê gelek tiştan kêmtir
dibin. Mînak:

- Ger û çûnên bi dibistan û Kitayê re
mit Schule und Kita
- Firavîn li dibistan û Kitayê
- Materyalên ji bo dibistanê
- Alîkariya çêkirina dersan
- Mehaneyên endametiya
komeleyan
- Kursên soberiyê
- Dersa muzîkê
- Betlane û demên serbest
... û gelek tiştên din

**Li vir bêhtir agahdariyan hûn
dikarin bistînin:**

Telefon: 05 11 – 61 62 63 64

E-Mail: BuT@region-hannover.de

Internet: www.hannover.de/BuT



Region Hannover



Hîna pirsên we hene?

Agahdariyên kite bi kite li ser alîkariyên pere ji bo
perwerde û beşdariyê, û formên miracaetê hûn
dikarin li ser malpera înternetê ya li jêr peyde bikin:
www.hannover.de/BuT.

Agahdarî û şewirmendiyeke ferdî wekî din hûn dikarin
bi telefon yan jî e-mailê ji tîma Alîkariya Pere ji bo
Perwerde û Beşdariyê ya Herêma Hannoverê bistînin:

Telefon: (0511) 61 62 63 64

E-Mail: BuT@region-hannover.de

Herêma Hannoverê

Jêrebeşa Civakî

Tîma Alîkariyên Pere ji bo Perwerde û Beşdariyê –50.11–
Hildesheimer Straße 20
30169 Hannover

Wêne:

Berg: © Sergey Novikov – Fotolia.com
Dî navê de: © yanlev – Fotolia.com,
© drubig-photo – Fotolia.com, © Kzenon – Fotolia.com,
© Gennadiy Poznyakov – Fotolia.com,
© grafikplusfoto – Fotolia.com

Rûpelsazî:

Herêma Hannoverê, Tîma Xizmetên Medya & Poste

Çap:

Herêma Hannoverê, Tîma Xizmetên Medya & Poste
Li ser kaxeta % 100 ji nû ve bikarhatînanî hatiye
çapkirin



Sprache: Kurdisch

HAN
NOV
ER



**PERWERDE Û BEŞDARÎ
LI DERGÛŞXANE (KITA),
DIBISTAN Û DEMA SERBEST DE**

Alîkariyên pere ji bo zarokan û mirovên
ciwan ên heta 25 salî



Region Hannover

Alîkariyên pere ji bo perwerde û beşdariyê çi ne?

Perwerde û beşdarî di jiyana nava civatê de kîlîten pêkanîna wekheviya şens in. Alîkariyên pere ji bo perwerde û beşdariyê destekê didin mirovên ciwan ên ji malbatên dahata wan kêr, da ku karibin bi awayekî xwedî mafên wekhev bin, pêşniyazên li dibistan, Kîta û demên serbest bi kar bînin. Alîkariyên pere di beşên li jêr de mumkin in:

▪ GER Û ÇÛNÊN BI DIBISTAN, KÎTA Û CÎHÊ MIQATEBÛNA BI ROJ A LI ZAROKAN

Mesrefên gerên komî û çûna deveran a gelek rojan dewam dike, ji bilî xerciyê bi temamî tî dayîn.

▪ FIRAVÎNA (XWARINA NÎVROJÊ) LI DIBISTAN, KÎTA Û CÎHÊ MIQATEBÛNA BI ROJ A LI ZAROKAN

Alîkariya pere tî dayîn ji bo qismekî firavîna bi hev re.

▪ PÊDIVIYÊN DIBISTANÊ

Ji bo mesrefên ku ji ber çûna dibistanê çêdibin, weke mîqdareke qubale meha Tebaxê bi 70 euroyî û meha Sibatê bi 30 euroyî alîkarî tî dayîn.

▪ VEGUHEZTINA ŞAGIRTÊN DIBISTANÊ

Heger di navbera malê û dibistanê de bêhtirî du kîlometreyan rêya bi meşê hebe û meqamekî din mesrefên rê negirtibin ser xwe, hingê ji bo veguheztina şagirtên dibistanê jî alîkariya pere dikare were dayîn.

▪ TÊŞWÎQKIRINA FÊRBÛNÊ

Heger ji bo şagirtan xwe gihandin û pêkanîna armancên fêrbûnê yê sereke ketibe tehlûkeyê, hingê mesrefên ji bo alîkariya fêrbûnê dikarin werin dayîn.



▪ ALÎKARIYÊN JI BO BEŞDARIYA LI JIYANA CIVAKÎ Û ÇANDÎ DI NAVA CIVATÊ DE

Çalakiyên ku dema serbest a zarok û ciwanan di nava civatê de teşwîq dikin – endametiya komeleyan, kursên soberiyê, demên serbest, dersên muzîkê û gelekên din – bi alîkariya pere tî destekirin. Ji bo vê serê şexs mehane 10 euro hatine veqetandin ku dikarin ji bo çalakiyên guhertî werin bikaranîn yan jî ji bo çalakiyeke mezin dikarin bî berhevkerin.

Kî dikare van alîkariyan wergire?

Kesên ku dikarin van alîkariyan bigirin mirovên ciwan in, eger ew yan jî malbatên wan yekê ji van alîkariyên li jêr wergirin:

- Pereyên békariyê II (SGB II)
- Alîkariya civakî (SGB XII)
- Alîkariya xênî û a'likariya pere ji bo zarokê (§ 6b BKGG)
- Alîkariyên ji bo dozkerên penaberiye (§§ 2 yan jî 3 AsylbLG – Qanûna Alîkariya Dozkerên Penaberiye)

Kesekî ku yekê ji van alîkariyên li jor nagire û bi xwe jî nikare mesrefên ji bo perwerde û beşdariyê bide, xwediyê wê derfetê ye ku bike ku heqê wî yê ferdî ye

ji bo alîkariyên ji bo perwerde û beşdariyê bide kontrolkirin. Heqê zarok û ciwanên ku hîna 25 saliya xwe temam nekiribin ji bo vê alîkariyê heye. Herçî alîkariyên ji bo beşdariya li jiyana civakî û çandî ya nav civatê ye, ew heta temamkirina 18 saliyê tî dayîn.



Ez çawa van alîkariyan wergirim?

Ji bo alîkariyên ji bo perwerde û beşdariyê divê miracaet were kirin. Ev miracaet dikare bê form jî bê kirin yan bi formekê bê kirin ku hûn dikarin li Herêma Hannoverê û Meqamên Alîkariya Civakî (Sozialamt) ên bajar û şaredariyan peyde bikin yan jî ji navnîşana înternetê ya www.hannover.de/BuT daxînin. Ji vê û wêde ravekirinên li ser derfetên miracaetkirinê jî li ser înternetê hatine belavkirin.

